

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



## XWENDEVANÊN DELAL

Hejmara kovara me "Kulîlk" ya dehan ji ber hinek hoyên (sebeb) taybetî demekê bi derengî ket.

Ji ber vê yekê, em hêvîdarin ku hunê li vî kêmasiya me bibûrin û dilên xwe li me teng ne kin.

Wek ku hun jî zanin, her weşan (pirtûk, rojname, kovar û w.d) bi alîkariya xwendevanên xwe jîna xwe di domînin. Em bawer in ku jiyana kovar kulîlk, dê bi alîkariya we, xwendevanên delal û şagirtên xoşevîst, her geş û ber dewam be.

Bi hêviya rojên xweş!

KULÎLK

Name yên xwendevana

Hevalêt hêja, Nivîsevan ê kovara "KULÎLK"ê !

Ev demê we bi xêr.

Hevalno: bi rastî derçûna kovara we pêngaveka girîng û xizmeteka hêjaye, bo hişyarkirin bilidkirin a perwenda netewî di nav Berebabê nûgeh (generation) da.

Di gel vê nivîsokê (name) parçe helbestek derbarey Cejna Newroz û serê sala Gel ê Kurd bo we diyarî dikim, ..... Her hijîn bi xweşî

BENGÎN  
26/2/1983  
CANADA

Heval û hevkarên "Kulîlk"ê

Zor sipas, mala we ava, ez hemû hejmarê kovara weya delal distînim û di nava zarokê Kurda da belav dikim. Hemî pir kêf xweş dibin, ... Bi rastî kovara we jibo mezina jî başe û fayda wê jibo gel ê Kurd pire, mirov ên mezin jî dikarin ji kovarê fêrê Kurdî bibin.

Silav ên Mêdiya û Dîdara ji Kulîlk'ê û zarok ê Kurdara hene

Pêşketina we daxwaza meye  
T.X.14  
Rewan 27/4/1983


# KULÎLK

Kulîlk guleke sor e, ji xwîn e  
Gelek hêja ye, derd û kulan hiltîne  
Mirov lê gelek heweskar dimîne  
Her bijî "Kulîlk" sorgula zarokên me

Ew bi zîmanê zikmakî diweşe  
Herî nêdî her bi xweşî dimeşe  
Zêr e, ji bo pêşveçûna çanda me  
Her nebe "Kulîlk", bor gul e bo çanda me

Zarokno, mezino ewe sebra dilê me  
Ew ber bi pêş ve dibe zîmanê me  
Wê bixwînin, herweha bidin xwendin  
Her bijî "Kulîlk" nîşana zîmanê me

BIRÎNDAR



## GOTINBÊJEK BI DIBÎSTANA KURDÎ RE

Xwendevanên delal şagirtên xoşevîst. Wek ku hun jî dizanin, dawîya havînê hat dîsa dibistan vebûn. Hîndekarî û perwerdekariyê dest pêkir.

Wek me berê jî (kulîlk hj:1) gotibû, "Îro li derveyê Kurdistanê, bi qasî 200-250<sup>1</sup> hezar Kurd hene. Hin ji wan tevî mal û malbata xwe ji welêt derketine û derbeder bûne. Hemû jî, li welatên dereke xwêhdan û keda destên xwe difroşin da ku pê debara xwe bikin.

Rewş û pergala karkerên xwedî mal, zar û zêç get ne baş e. ... Herçî rewşa zar û zêçên karkerên Kurda yên li derveyê welêt, gelekî dil soj e. Dijwar û xemdar e. Zarok ji xwendin, hînbûn û zanîne bê pehrin û jê pir bi dûr in. Ew wek li welêt, dîsan di şevreşa tarî ya nezaniyê dane. Çav girtî ne, çav girtî dimînin, çav gitî û nezan tên hîştin.

Li welatên ku karkerên Kurdan tê de dimînin û li wê dixebitin, bi tenê li welatek

---

1: Hejmara jorîn li gorî sala 1978-79 hatiye nivîsandin. Îro hejmara Kurdên li derveyê welêt, nêzîkî nîv milyonî ne.

-Navê dibistana me "Dibistana Roja Şemiyê ye. Ji ber ku ew bi tenê rojên şemiyên vekirî ye. Ev "dibistana roja şemiyê" ji bo zarokên biyaniyan e. Zarokên biyaniyan, rojên tînanê dibistanê û li ser zimanê çanda xwe dixebitin. Ji derveyê me di vê dibistanê de grûbên zarokên Êrmeniyên, Emrîka Latîni, Ereban, Erîtriyên, Asûriyan û Fîniyan jî hene. Grûba zarokên Kurdan ji sala 1982'an bi vir de li vê dibistanê ne. Em dixwazin dîrok, zimanê çanda kurdî bi zaron bi din nas bikin. Em di vî aliyê de gelek serfiraz jî bûn.

Me ji zarokan du (2) grûb pêk anî. Yek ya folklorê û ya din jî koroyê ye. Herdu grûbên me jî derketine şevan. Wan di şeva Newrozê da bala herkesî kişand ser xwe.

Li Swêdê, li her taxê mezînan, salê carekê biyanî û swêdî di nav xwe de festîvalan çêdikin. Sala çûyî grûba folklorê me derket du ji van festîvalan.

-Ji bo agadariya we em pir spas dikin û hêvîdarê serketina we ne.

-Spas xweş


10/8/1983

mafê xwendina bi zimanê zikmakî yê şagirtên dereke heye. Ev welat jî Swêd e. Zarokên dereke xwedî mafin ku di dîstînan Swêdî de bi zimanên xwe bixwînin. Ji ber vê yekê, li Swêd, zarokên Kurda jî xwedî maf in, ku di dibistanan de bi zimanê xwe yê zikmakî bixwînin. Zimanê dereke û resmî, di nav zimanên derke yên curbecur de cihê xwe girtiye.

Ev çend salin ku zarokên Kurda yên li Swêd, serfîraziya bi zimanê xwe yê zikmakî xwendine diçêjin. Herçendî ne li gor daxwaza dile jî, lê dîsan ji bo pêşvebirina zimênre keysekê hêjaye. ....  
1980. kulîlk hj:1 rp.2,3".

Li bajarê Stocholmê, di piraniya taxan de dibistanên kurdî hene. Yek ji wan dibistanan li taxa Spångayê (Spånga) ye. Ji vê dibistanê re dibêjin "Dibistana Roja Şemiyê". Em rojêke şemiyê bûn mêvanê dibistanê. Em çûn dersxana kurdî û em bi mamoste û şagirtên Kurd re peyvîn.  
-Gelî mamostên hêja! Gelo hun dikarin armanc, kar û barên dibistana kurdî ji me re pêşkêş bikin?.

..//..



DERS: Kurdî

BABET: Xwendin û nivisandin.

Bî zimanê xwe bixwînin  
û binivîsin!





TE WESFÊ XWE DIDA, DIGOT EZ MÊR IM.

Te wesfê xwe dida, digot ez mêr im.  
Rojên qewamê ez pir bi kêr im  
Min bi te bawer kir, min xwe sparte te  
Lê mal mîrato ka derewên te.

Dotmam van tehna li min nexe,  
Navê min bi tirsonekî dernexe.  
Ma daxwaza bilbil ji gulê pê ve çi ye?  
Lê ku başk şikestî bin wê bilbil çi bike?

MALWÊRAN

31/03/1982



HESRETA WELAT

Ezê herim Kurdistan!  
Avakim bax û bostan.  
Heta nebînim welatê xwe,  
Piyê min naçe goristan.

Ezê herim welat!  
Avakim birc û kelat!  
Navê Şehîdên Kurd,  
Bilind kim wek Sîpanê Xelat.

Mêdya  
26.3.1983 STOCKHOLM



## ÎNÊ CAN

Xwezî dîsa zarû bûma  
Tifalekî bê zar bûma  
Li ber bêşikê lorî-lorî  
Te bigota îne can!

Min bavêta xwe çelepiyan  
Bê qewet û bê guman  
Te ez hildam hemêza xwe  
Bi dilê şa, îne can!

Bi zarekî tilî xweşkok  
Min vekira xeberdan  
Û xebera xwe ya pêşîn  
Min bigota îne can!

Xwezi, hezar xwezil dîsa  
Tifalekî bê zar bûma  
Emrê te jî paş de biçûya  
Tu cahil bûya îne can!...

Torinê Osman



## ŞAH Û GUNDÎ

Dibêjin ku demekê li welatekî Şahêk (Qiralek) hebû. Rojekê Şah dixwaze bêhnekî ji xwere bigere û diçe nav dehlan.

Piştî demekî dibîne ku wa ye gundiyeke daran dişkêne. Şah nêzîkî yê gundî dibe û silavê lê dike.

-Xwedê gewetê bide te.

Gundî serê xwe bilind dike û berivê dide.

-Bêî ji geweta Xwedê min tiştêkî nevê.

Mêrikê gundî dîsa dest davê bivir û karê xwe dike. Lê Şah jî dixwaze hinek di gel wî bipeyive.

-Mala te pir qeşbalix e ?.

-Du kur û du keçên min hene.

-Hun pir qeşbalix nayne hesabê, Tu perê xwe pê çi dikî ?.

-Ez, perê xwe dikim sê pehr. Pehrek ji bo deynê min e, pehrekê bi deyn didim, pehrekê jî bi avêde berdidim.

Şah li ser gotina mêrikê gundî gelek difikire, lê qet dernaxe ka ku wî çi got. Li ser vê yekê mêrikê gundî vedike.

-Deynê xwe didim, yanê li dê û bavê xwe mêze dikim (xwedî dikim), bi deyn didim jî yanê li herdu kurên xwe mêze dikim, bi avêde berdidim, li herdu keçên xwe mêze dikim.



-Mêze dikim tu gelek jîr î.Lê min riya xwe wenda kiriye,de vê carê rê nîşanî min bide da ku bikaribim ji nava van dehlan derkevim.

-Riya xwe bi xwe bibîne.Waha rast here paşê li ser destê rastê bizivire,di dû wî de jî li ser destê çepê bizivire, paşê dîsan li ser destê rastê ..... .

-Bi van gotinên te ez rê dernaxînim pêwîst e ku tu nîşanî min bidî.

-Ez benî zemanê min qet tuneye,ku rê nîşanî te bidim.Ji bo me cotkaran zeman pere ye.

-Baş e ku ji bo te zeman pere ye, ezê perê te bidim.

-Ku tu perê min didî,ezê re nîşanî te bidim,de fermo em biçin.

Gundî û Şah bi hev re dikevin rê û diçin.Demek paşê Şah ji gundî dipirse.

-Pîremêr,ka ji min re bêje,tu qet ji van deran bi dûr de çûyî yan na ?.

-Bi Xwedê car caran virde-wêde diçim,

-Başe te qet Şah dîtîye ?.

-Naxêr min qet nedîtîye,lê min dixwest bibînim.

-dema ku em derketin wê rasta ha, tu

dê Şah bibînî

-Baş e dê çewa wî nas bikim ?.

-Ji şah bêtir wê serê herkesî vata(vekirî)be,bi tenê dê ew bi kum be,tu dê ji wê derê nasbikî.

Dema ku derketin meydanekê,her kesê ku Şah dibîne kuma xwe ji serê xwe der dixîne.Yê gundî bi hişyarî li dora xwe mêze dike,lê ew kesê ku dixwaze bibîne,nabîne.Dizivirê ji Şah dipirse:


-Ma kanê Şah li ku derê ye ?.

Şah dikene û jêre dibêje:

-Yek ez û yek jî tu bi kum î Şah yan ezim yan jî tu yî!.

(Î.QASIM)

Ji çîrokên  
Leo Tolstoy



## HÊVIYÊN PÊŞEROJÊ

Kutroka warê zozana, dê bifrêt  
Teqla li xwe, helberit  
Kewê ribadê kostana  
Bi xwe cihê landika jiyânê  
Li bin keresiya dê bixwîne  
Li serê tilm û zinara dê bixurêt  
Bi jivanê biharê, da bibînit xemla yarê  
Da çêkin hêlînê piştî zivistanê  
Nemana sir û sermayê, .....

Avî darêt deşt û zozana  
Dê bigirnijin, dê raçinin  
Gerê dîlanê, bi sitranêt jiyânê  
Bi avazê viyanê, .....

Zarokê bê guneh fêkiyê nav malê  
Kulîlkê bask û betana,  
Rengînê mêrg û çema,  
Dê veke çavêt geş, ...  
Bi hêviya pêşerojeka xweş  
Destê nerm û şil, .....

Dê bihavêje gerdena Dayika dil bi kul  
Bi hêviya rojeka geş, ...  
Agirê serê li serê çiya  
Lê dipeşin pêlêt azadiyê  
Durwişmê mêraniyê  
Ku gel rizgar be li tariyê!



Hêjta gêncê Kurda hêşyar û rindin  
Bi xwe gorî û ser bilindin  
Dê bi parêzit şar û gunde  
ronahiyê agirê Newrozê,

Bîrhatina serketinê,  
Li ser tepeseriyê, bindestiyê  
Gelê azadê Kardoxiya  
Bi mêrxasî girt bersingê,  
Dehaq, Grêk û mongoliya

Bi serkêşiya Kawayê hesinkar  
Pale, cotkar, bindest û tepeser  
Têkda rabûn û hatine der

Bibin yek deng û hezar hewar  
Bibine yek hêz û hezar ceger  
Bibine yek hêrîş, hezar derbider û dil keser  
Li jêr sîbera çakuçê hesinger  
Hêjand Ala ya sor û zer  
Rakirin şûr û tîr, tevr û bivir  
Tevlî das û xencer, .....

Tevda bûne tîp û qumşol,  
Herişandin serê xwînmijê zordar  
Bi hezaran gênc li zindanan hatin der  
Şahî kirin bo nemena rojên tepeser

Çirîskêt agirê Newrozê  
Birûskêt mizgîniyê,.....  
Hewar û gaziyêt aziryanê

Deng veda çiya û newala  
Guriya agirê Newroza Kurda  
Bo dirwişmê azadiyê,serbestiyê  
Di nav cîhanêde,.....

Çire û şemalkêt yunanê  
Sê gurka yariyêt olimpiyadê  
Hemî pêlêt agirê Newrozê ne  
Hemî dirwişmêt azadiya gelanin  
Lê,li vî çaxî tenê em bindestin,  
Dev bestin bê ristin,.....

Guriyeka agirê Newrozê dê hilkim  
Zarokên Kurda dê li dora agir komkim  
Dê bo wan bêjim û vegêrim,.....  
Serhatiya Kawayê dilêr,....  
Aziryana gelê bindest  
Şoreşa rênçberêt tepeser.

Serbilind û şêr,.....  
Ka çito azadbin,  
Bo zarokên xoştivî,  
Dê bêjim,vegêrim,.....  
Ka çito gelê me bi serket

Û ronahî da Cîhana tarî,  
Da zarokên me ,bo zarokên Cîhanê,  
Bêjin û vegêrin,.....

Ka çiyê Newroz,  
Çiyê serê sala me,  
Serê sala gelê Kurd,  
Gelê bindest û tepeser.

Destikê pişkojêt sorgula\_  
Di gel rondikê hêviyê  
Bo serketinê û azadiyê  
Diyarî bo zarokê xoştivî,  
Hêviyêt pêşeroja glê me,.....

#### BENGÎN

#### FERHENGOK (bo helbesta jorîn)

Girnijîn	:Pêkenîn
Dirwişm	:Nîşan
Dilêr	:Qehreman
Girêk	:Yunan
Diyarî	:Hediye,Yadîgar
Tepeser	:Bindest
Aziryan	:Şoreş
Kardox	:Di dîrokê de navê gelê Kurd
Qumşol	:Kom



## G U R Û R O V Î

Di wextekî de, li çiyayekî roviyekî pir fenek hebû. Weke ku em tev dizanin, rovî bi fenên xwe bi nav û deng in.

Rojekê rovî çû qula xwe nêzîkî gundekî çêkir û li wê bi cîh bû. Li nêzîkî wî gundî jî rezek hebû. Rovî her roj diçû diket nava rez, têr tirî dixwar û dihat diket gulika xwe. Rojekê xwediyê rez hat nav rezê xwe, dît ku çi bibîne, wa ye tiriyên wî tev hatine xwarin.

Xwediyê rez rabû çû xefkek (dehfik, feq)anî û li nav rez veda, da ku bikaribe dizê xwe bigre. Roviye me jî dadikeve nava rez ku zîkê xwe têr bike. Carekî çavê wî bi xefikê ket ku waye dûvekî berana jî li ser e. Hema rovî ber bi paş vegeriya. Piştî demekê rastî gurekî hat.

- Merheba birakê gur
- Merheba birakê rovî
- Ma tu dê bi kû de herî ?
- Bi Xwedê ez dê ji xwe re tiştêkî xwarinê bigerim.
- Baş e, tu dixwezî dûvê beranan bixwî ?
- Mal nexerabo, kê naxwaze dûvê beranan bixwe ?

- De were bide dû min.

Gur rabû da dû rovî û berê xwe dan nav rez.

- De binêre, ha wa ye dûvê beranan. De îcar here û têr bixwe.

Gur bi lez çû û xwe avêt ser dûvê berên. Çaxa xwe avêt ser, ji nişka ve xefkê çelpiya û ket stûyê wî. Gur ma di xefkê de û banî rovî kir.

- Birakê rovî ev çî ye gidî, were min ji vir xelas bike.

- Bi Xwedê ez nikarim.

- Birakê rovî wilo nabe, hema şîretê li min bike.

- De baş e. Binêre, gava xwediyê rez hat tu xwe bimirîne û çavên xwe bigre û diranên xwe qîç bike. Wê gavê tu jî rabe û bireve.

Roja din xwediyê rez hat û nihêrî ku, va ye gurek di xefkê de ye û tê de mirî ye. Rabû ew ji xefkê derxist û avêt pişta şikêran. Gava ew avêt, gur rabû û baz da.

Xwediyê rez:

- Way bêxwedîko, wî ez xapandim. De baş e, ma ne ez dê te careke din bigrim.

Rovî jî dizane, ku gur nema dev jê digere, rovî rabû çû ber çalekê û xwe berda çalê.

## KED ŞÊRÎNE

Kes nizane ka çî hênê  
Xortek hebû li vê dinê  
    Wî xerc dikir mal û hebûn;  
    Li alemê bûbû beytûn...  
Mal-hebûna dê û bavê  
Wî pûç dikir, davêt avê,  
    Bavê dît ku waha nabe,  
    Şuxulê kurê wî xirabe,  
Divê: "Lawo êdî bese,  
Gerek bixebitî ese"!.  
    Ji wê rojê, ji wê wextê  
    Kur dikeve ser xebatê,  
Derbas dibê roj û hefte,  
Perê xebata wî xortê tê.  
    Û bav tîne hema li wir  
    Perê xort davê agir...  
Xort di cîda dike qêrîn:  
-Ked ku heye zehf şêrîn e:  
    Divê çima perê min ê pir  
    Te avête nava agir.?.  
Bav di bêje: "Lo-lo beytûn  
Çima perê min ne pere bûn?,  
    Ku te dibir dikir kor û pûç,  
    Çaxê min danî û dikir qûç.  
Tu vî gilî bi fehmîne,  
Ked ku heye zehf şêrîne.  
    Axir em jî evd û însan bûn,  
    Xweyê keda xwe ya helal bûn".

Xelîlê Çaçan Mûradov

rojnama "Rêya teze" 1/1/1977



Çal jî tijî av e. Du dewl li ser çalê hebûn, yek dadiket û jî hildikşiya.

Gur jî ji germa pir tî bûye, gur hat ser çalê û carekê nihêrî ku va ye rovî di çalê de ye.

Gur:

- Ne wa ye, min tu girtî, dê tu bi kû de xelas bî

- Birakê gur, ma tu halê min nabînî ? Hewqas tişt ji bo te hatine serê min. Min dixwest ku herim alîkariyê ji te re bînim û ez ketim vê çalê.

- ..... !

- Ma tu li min nabihurî ?

Wê carê dilê gur pê şewitî.

- De baş e, ez li te dibihurim, lê te dê çawan ji vê çalê derkevî ?

- De binêre, dewlek vala li ser devê çalê heye, bikeve nava wê, tu dê bê xwarê û ez ê jî derkevim derve.

Gur rabû ket hundirê dewlê, hingê giran bû ji nişka ve ket binê avê û rovî derket der.

Gur mêze kir ma di çalê de.

- Birakê rovî min te xelas kir, de ka îcar tu min xelas bike.

- Na bi Xwedê ez te xelas nakim.

- De baş e, vê ji bîr neke, ez vê carê big



rim, sax nahêlim.

Rovî rabû û çû. Gur di çalê de ma.

Rojekê karwanek rastî çalê hat, gava av kişandin mêze kirin ku dewla wan pir giran e. Dema dewl bi jor ket, hema gur jê derket û bazda, bi vî awayî xelas bû.

Rovî pê hesiya ku gur li dû digere. Roviye fenek rabû çû ser rêkî û rawesta, di wê rê de gelek karwan diçûn û dihatin. Karwanan dema helaw dixwarin, kaxizê helawê jî diavêtin. Rovî jî ew kaxiz berhev dikirin, berê ew dialastin û paşê jî dixistin bêrika xwe.

Gur jî daye ser rê û li rovî digere. Carekê gur dît ku wa ye rovî li ser rê rawestiye.

- Wey, mamê rovî dê tu vê carê bi kû de herî ? ma ev çendik û çend ji te re lo ?

- Birakê gur, de ka destura axaftinê bide min ku derdê xwe ji te re bibêjim. Ma tu çet nabêjî, çima tu ketî van rewşan ?

Rovî kaxizên helawê ji bêrika xwe derxist û nişanî gur da.

- De mêzeke, ez ji bo te çûm li hemû bajarê geriyam û min ev ewraq tev dan îmze kirin, lê tenê bajarê Mêrdînê maye, ger ew jî îmze bikin, destûra hemû heywanan der-

dikeve, ku bi serbestî herin li nav bajaran bigerin û her tiştî bixwin.

- Wey, bi Xwedê ev tişteki gelek baş e. De ka bide min, ez dê bi xwe herim Mêrdînê bidim îmze kirin.

- De başe fermo birakê hêja, riya te vekirî be.

Gur gelek kêfa xwe anî û kaxizên xwe girtin û berê xwe da ser riya Mêrdînê.

Piştî ku gur bi dûr ket, rovî di dilê xwe de got "De here ku tu vê carê jî bifilitî , bi Xwedê dizanim êdî ev der li min heram in.


.....  
Gurê me jî ha li vir û lu wir sibêtirê gi-hîşte Mêrdînê, bi jor de hilkişiya çû ber derê qereqolê û kaxizên xwe dirêjî eskerê ber derî kir. Dema esker dît ku va ye gurek di ber de ye kire qêrîn.

- Kuro werin gurek va ye.

- Kuro zû wî bikujin.

Eskeran rabûn gur dan ber gulên tifingan û kuştin. Rêviyê me jî ji tirsê gur xelas bû.

BIRÎNDAR




W Ê R I S Ê N K U R D A N  
ZAROK DIBÊJIN

Zarok dibêjin, em in kûlîlkên Kurda  
Ji me tê xwestin, rizgar kirina bajar û gunda  
    Zarok dibêjin em in, em in ev kelat  
    Ji me tê xwestin DÎCLE û FERAT  
Zarok dibêjin em in lêlan  
Ji me tê xwestin govend û dîlan  
    Zarok dibêjin em in wêrisên felat  
    Ji me tê xwestin CÛDÎ û XELAT  
Zarok dibêjin em in wêrisê kêf û xweşî  
Dişkînin zincîrê koletî û reşî  
    Zarok dibêjin em in gelêr  
    Ji me tê xwestin ZAXO û HEWLÊR  
Zarok dibêjin em in, em in hêvî  
Ji me tê xwestin ceng û civî  
    Zarok dibêjin em in SERDAR  
    Li benda me ne girtî û bendewar  
Zarok dibêjin em in mêrxwas  
Em hildidin çakûç û das.

Silo Saxlam, Almanya Rojava

# M I J Û L Î



Ji van şikla hemî li hev in bê ji yekê kîjan e ?.

## PÊKENÎN

### RADYO

Di wextekê de xortek çûbû bajêr. Hê wan deman jî nû radyo derketibûn û xelkê ku didîtin lê di man ecêb mayî. Xortê ku çûbû bajêr, bi çend quruşan jî xwe re radyoyek kirî û bi xwe re bir gund.

Bavê wî xortî jî mirovek pir sofî bû. Rojê pênc wext nimêja xwe dikir û belengaz hê navê radyoyê jî ne bihistibû û ne dîtibû.

Li biniya gundê wan jî hewzeke avê hebû. Sofiyê gund hercar diçûn ser wê hewzê û destnimêja xwe digirtin. Rojekê xort radihêje radyoya xwe û diçe ser hewza avê, dengê wê vedike û wê dixê nava giya, vedişêre. Bavê xort, yê sofî jî dide rê diçe ser hewzê, da ku destnimêja xwe bigre.

Carekê Sofî dengê dibihîze. Sofî hinekî ditirse û dibêje:

-BÎSMÎLAHÎREMANÎREHÎM

Sofî cerdin dengên tevlihev û curbecur dibihîze. Canê sofî dilerize û dikeve nava tirsan, li dira xwe mêzedike lê kesî nabîne,

yek carî ditirse û ji xwe re dibêje:

-Ev heye tune ye cinin an jî pîr eboçikin. Dengê radyoyê di nava giya de ge kê m di-be û geh zêde dibe. Sofî yekcar çavên wî fireh dibin û bi hêrs dibêje:

-Pa bi xwedê evya pîr eboçike, divê ez wê bigrim û bukjim. Sofî radibe bi dilek bi tirs ber bi deng ve diçe. Lê ji tirs a çavên wî di nava serê wî de bûne weke tasan, hêdî hêdî xwe nêzîkê deng dike, çaxa nêzîk dibe hema ji nîşkeve xwe davêje ser giyayê ku deng jê tê.

-Wah-wah ma tê bi mude herî ?. Çi qîje wî-ja te ye ?, bi Xwedê tu çixasî bikî qîje-wîj jî ezê te bikujim.

Sofî radibe radihêje radyoyê li bin guhê kevîran dixîne û perçe dike.

Bi xar diçe li nava gund belav dike:

-Kuro bi gora bavê min, min îro pîr eboç-kek girt û kuşt !.

FERHENGOK

Axaftin	:Peyivîn,qisekirin
Bersiv	:Cewab
Birc	:Sera,qesr,xaniyê mezin. Wek,Birca Belek(li Cizîra Bota).
Cotkar	:Yê ku karê wî cotkirin e, Rêncber.
Çand	:Kultur
Dadgeh	:Mehkeme
Debar	:Îdare
Dehl	:Daristan,rêl,devî
Dereke	:Biyani,xerîb
Deyn	:Qerz
Dirav	:Pere
Dîrok	:Tarîx,mêjû
Fenek	:Fêlbaz,hîlekar
Fen	:Fêl,hîle
Fermo	:Kerem bike
Festîval	:Mehrîcan
Gel	:Xelk
Gelek	:Pir,zehf
Gelek baş e	:Pir baş e,zor baş è, zehf baş e
Di/li gel	:Pê re



Di/li gel wê/wî	:Bi wê/wî re
Mixa bin	:Heyf
Pir mixa bin	:Pir heyf
Pêk anîn	:Çêkirin,sazkirin,li dar xistin
Pêwîst	:Lazim
Sîpanê xelatê	:Li Kurdistanê navê çiyakî bi nav û denge, ku çîroka Siyabendê Si- lîvî û Xecê li vî çiya- yî derbas dibe
Şixul	:Îş,kar,şol
Tax	:Mehle,har
Tifal	:Zarok,zarokên sawa, zarokê piçûk
Xefik	:Faq,dehf,dehfik,tele
Xort	:Genc,ciwan
Wesf	:Pesn
Vata	:Vekirî,ser vekirî,payî
Zor/e	:Zehmet e
Zor baş e	:Pir baş e,gelek baş e

ÇEND PIRS

1)Di devê mirov de çend diran hene?.

Bersiv:..

2)Gelo hun dizanin di laşê mirov de tiştên dîtinê, bêhnkirinê, bihîstinê û tamkirinê çine?.

B: ... .. .

3)Tiştêkî sor e û di laşê mirovde digere.Gelo ew çiyê?.

B: ....

4)Di nav kelê serê mirov de tiştêk heye navê wî çî ye?.

B: ....

5)Yê ku di nav devê mirov de ye ew çî ye?

B: .....

6)Sê dan xwarina rojê.Gelo hun dizanin navên wan çî ne ?.

B: ..... .. .

7)Cejna Newrozê ji bilî gelê Kurd di nav çend netwên din de jî tê pîrozkirin Gelo ew kîjan in ?.

B: ..... .. .

8)Ala Gelê Kurd ji çend rengan pêk tê û navên wan rengan çî ne ?.


B:Ji ... rengan pêk tê,ew jî... .. . û ... ne.



## XAÇEPIRS

	1	2	3	4	5	6
1						
2						
3						
4						
5						



Çepe\_rast: 1- Li Kurdistanê navê çiyakî  
 2- Di zareva soranî de ev. 3- Ciyê Za-  
 rokên piçûk (dergûş), 4- Di zirava Za-  
 zakî de Agir, 5- Di zimanê Tirkî de na-  
 vê Jinekê,

Sere\_jêr: 1- Bi Kurdî navê Keça, Jina,  
 ne şilo, 2- Hazir, 3- Curekî qûtê xwa-  
 rinê, 4- Jê nan tê çêkirin, 6- Mirov  
 di zivistanan de dikşîne ser gora, çêli-  
 ka gamêşê





			B			
1	G	I	R	I	K	
2	S	Û	J	I	N	
3	Z	E	V	Î		
4	N	A	N	P	Ê	J
5	A	V	J	E	N	E
6	N	E	W	R	O	Z
7	Q	E	R	T	E	L
8	T	O	P			
9	Q	A	Z	A	X	



UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

PRIS : 10:- skr  
BIHA